



# MECÎDÊ HEMGULÎ: JIYAN, DENG BÊJÎ Û BERNIVÎSANDINA DESTANA MIHEMED EMÎN (LEYLA Û MECRÛN)

Sevim HATUN SÜRÛCÛ

Mecîd Hemgulî: Life, Dengbêjî and Writing of the  
Epic of Mihemed Emîn (Leyla and Mecerûn)

Mecîd Hemgulî: Hayatî, Dengbêjîgi ve Mihemed Emîn  
(Leyla ile Mecerûn) Destanının Yazıya Aktarılması

## Sevim HATUN SÜRÛCÛ

ORCID: 0009-0008-9970-9242 | sewimhatun@gmail.com

PhD Student, Institute of Living Languages, Department of Kurdish  
Language and Literature, Bingöl University, Türkiye.

## Citation/Jêgir/Atıf:

Hatun Sürücü, S. (2024). Mecîdê Hemgulî: Jiyân, dengbêjî û  
bernivîsandina destana Mihemed Emîn (Leyla û Mecerûn). Kurdiyat  
(10), 41-65. DOI: 10.55118/kurdiyat.1555489

## Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 24.09.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 25.11.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

## Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Taraflı  
Kör Hakemlik-İki hakem

## Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./  
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu  
makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

## Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed  
while carrying out and writing this study and that all the sources  
used have been properly cited./ Hatiye beyankirin ku di pêkanî û  
nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etik hatine şopandin û  
hemû çavkanî bi awayekî tîkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma  
yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan  
tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

## Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in  
the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokiya  
berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında  
herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

## Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in  
support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê  
vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu araştırmayı destekle-  
mek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

## Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisansla- ma:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work  
licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC  
4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan  
yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif  
hakklarını saklı tutarlar.

**Kurte**

Dengbêj Mecîdê Hemgulî li herêma Efrînê (Çiyayê Kurmênc) navdar e. Di nav çanda dengbêjiyê da, li cem dengbêjên hoste yê wêkî Evdê Şerê û Hesên Nazî ku li herêma Çiyayê Kurmênc navdar in gihaye û ji gelek dengbêjên serdema xwe yê wêkî Cemîl Horo, Elî Tico û Bavê Selah ra hevaltî û hostetî kiriye. Berhemên wî ji sala 1990î heta sala 2002yê bi awayekî professional tên qeydkirin. Lê di lîteratûra nivîskî da derbarê jîyan û berhemên wî da xebat tunene. Armanca vê xebatê ev e ku dengbêj Mecîdê Hemgulî bide nasîn û li ser dengbêjiya wî raweste. Ji bo lêkolîn û tesbîtkirina jîyan, dengbêjî, berhem û meseleya qeydkirina kilamên Hemgulî, bi xizm û nêznasê wî ra pêwendî hat danîn. Peyra, pirsên hevpeyvînê hatin amadekirin û hevpeyvîn hatin kirin. Herî dawî daneyên hevpeyvînan hatin nivîsandin û analîzkirin. Di encama analîzan da ewil biyografiya Hemgulî hat nivîsandin. Peyra di bin sernavê dengbêjiya Hemgulî da mijarên wêkî peywenda hoste-şagirt, gotina jixweber, kilam û mekanên îcrayê hatin vekolan. Herwiha, beşeke biçûk ji bo hevdunasîna Hemgulî û tembûrvan Wehîd Xelîl hat veqetandin û behsa meseleya qeydkirina kilaman hat kirin. Di çarçoveya xebatê da destana Mihemed Emîn hat bernivîsandin, behsa varyantên wê yê devkî û nivîskî hat kirin û kurteya destanê hat dayin. Metna destanê jî li gorî xisûsiyetên zimanê herêma Efrînê û uslûba vegêr hat bernivîsandin û wêkî pêvekê hat dayin. Peyvên erebî, tirkî û herêmî di jêrenotan da hatin ravekirin. Di encamê da eşkere bû ku Hemgulî di nav çanda dengbêjiyê ya Efrînê da navekî giring e, bi saya bîra wî ya xurt pirberhemên qedîm gihane îro.

**Peyvên Sereke:** Dengbêjî, Dengbêj, Efrîn, Mecîdê Hemgulî, Destana Mihemed Emîn.

**Abstract**

Dengbêj Mecîd Hemgulî is famous in the Afrin region (Çiyayê Kurmênc). Within the framework of the tradition of dengbêj, he was trained alongside the master dengbêj of the region such as Evdê Şerê û Hesên Nazî, and was a friend and master of dengbêj of his time such as Cemîl Horo, Elî Tico and Bavê Selah. His works were recorded professionally between 1990 and 2002. However, no study has been done about his life and works until today. The aim of this study is to introduce Mecîd Hemgulî and investigate his balance. Hemgulî's relatives and acquaintances were contacted in order to determine his life, his identity, his works and the process of recording his works. Then, interview questions were prepared and interviews were conducted. Finally, the interview data were transcribed and analyzed. As a result of the analysis, Hemgulî's biography was written. Under the title of Hemgulî's dengbêj, topics such as the master-apprentice relationship, the performance of his works, his works and performance venues were examined. In addition, the meeting of Hemgulî and the tambourvan Wehîd Xelîl and the recording of their prayers were touched upon. Within the framework of the study, the epic of Mihemed Emîn (Leyla and Mecnun) was transferred to the literature and added to the study, and brief information was given about the written and oral variants of the work. Arabic, Turkish and regional dialect words in the epic were explained with footnotes. As a result of the study, it turned out that Hemgulî is an important name in the Afrin dengbêj tradition. Thanks to his strong memory, many ancient works have survived to the present day.

**Keywords:** Dengbêj tradition, Dengbêj, Afrin, Mecîd Hemgulî, Epic of Mihemed Emîn.

**Özet**

Dengbêj Mecîd Hemgulî, Afrin bôlgesinde (Çiyayê Kurmênc) ünlüdür. Dengbêjlik geleneği çerçevesinde, Evdê Şerê û Hesên Nazî gibi bölgenin usta dengbêjlerinin yanında yetişmiş ve kendi döneminde yetişen Cemîl Horo, Elî Tico ve Bavê Selah gibi dengbêjlerle arkadaşlık ve ustalık yapmıştır. Eserleri 1990-2002 yılları arasında professional olarak kayıt altına alındı. Ancak hayatı ve eserleri hakkında günümüze kadar herhangi bir çalışma yapılmamıştır. Bu çalışmanın amacı Mecîd Hemgulî'yi tanıtmak ve onun dengbêjliğini araştırmaktır. Hemgulî'nin hayatı, dengbêjliği, eserleri ve eserlerinin kaydedilme sürecini belirlemek amacıyla akraba ve tanıdıklarıyla iletişime geçildi. Daha sonra görüşme soruları hazırlanarak röportajlar yapıldı. Son olarak görüşme verileri yazıldı ve analiz edildi. Analiz sonucunda Hemgulî'nin biyografisi yazıldı. Hemgulî'nin dengbêjliği başlığı altında usta-çırak ilişkisi, eserlerini icrası, eserleri ve icra mekanları gibi konular incelendi. Ayrıca Hemgulî ile tembûrvan Wehîd Xelîl'in tanışmasına ve kılamlarının kaydedilmesi konusuna değinildi. Çalışma çerçevesinde Mihemed Emîn (Leyla ve Mecnun) destanı lîteratûre geçirilerek çalışmaya eklendi ve eserin yazılı ve sözlü varyantları hakkın da kısa bilgi verildi. Destanda yer alan Arapça, Türkçe ve bölge ağzına özgü kelimeler dipnotlarla açıklandı. Çalışmanın sonucunda orta çıktı ki Hemgulî Afrin dengbêjlik geleneğinde önemli bir isimdir. Onun güçlü hafızası sayesinde birçok kadim eser günümüze ulaşmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Dengbêjlik, Dengbêj, Afrin, Mecîd Hemgulî, Mihemed Emîn Destanı.

## Destpêk

Li herêma Berferatê<sup>1</sup> dengbêjên bi nav û deng ên wekî Evdê Şerê, Şêx Simaq, Hesên Nazî, Hemîş Kûrik, Cemîlê Evdê Kerrê, Îbrahîmê Tirko, Evdîlqadir Hesên Nazî, Mecîdê Hemgulî Cemîl Horo, Elî Tico û gelek dengbêjên din gihane. Mijara vê xebatê jîyan û dengbêjiya Mecîdê Hemgulî ye ku nêzî 30 saetî kilamên wî bi awayekî professional hatine tomarkirin, îroroj li ser *Youtube*ê tîr parvekirin û guhdarîkirin. Hemgulî yek ji wan dengbêjên herêma Berferatê ye ku di peywenda hoste-şagirt da gihaye û kilamên Evdê Şerê, Hesên Nazî û gelek dengbêjên din vedigêre. Pîraniya kilamên ku vedigêre destanên dirêj ên wekî *Dewrêşê Evdî*, *Memê Alan*, *Cembelî*, *Ûs û Ezîz*, *Arzi û Qember*, *Mihemed Emîn (Leyla û Mecer[n]ûn)* in ku ji saet û nivê heta sê saet û nivê dikşînin. Herwiha dengbêj Hemgulî li “Qehwexaneya Xirîsto” ya ku li Helebê vedikin, hostetîya dengbêjên li dû xwe yê wekî Cemîl Horo, Elî Tico û gelek mitribên herêmê jî dike. Dikare bê gotin ku li herêma Berferatê çandê qedîm ya dengbêjiyê heye, di nav vê çandê da gelek dengbêjên berhemdar gihane. Lêbelê wextê li lîteratûra li ser dengbêjan tê nihêrin tê dîtî ku ji bo dengbêjên herêmê pareke biçûk hatiye veqetandin, ango bi tîra xwe xebat nehatine kirin.

Ji xebatên li ser çand û folklorê herêma Berferatê ya herî kevnare berhema A. v. Le Coq ya bi navê *Kurdische Texte* (Metnên Kurdî- 1903) ye. Di nav vê berhemê da destanên ku ji herêma Berferatê hatine tomarkirin hene. Kitêba dezgeha Sema Kurdê ya bi navê *Geştek di Bîrweriya Çiyayê Kurmenc de* (2012) li ser jîyan û civaka Efrînê ye. Hemkoçer bi taybetî berhemên Reşîdê Memçûçan tomar kirine û ev xebat bi navê *Bêrîvana Cindî*, *Çend Destan û Serhatiyên Devera Efrînê* hatiye çapkirin. Di kitebên *Êpîk*, *Destan* ên Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl da (2014a; 2014b; 2014c) kurtejiyan û berhemên çend dengbêjên navdar ên herêma Efrînê yê wekî Hesên Nazî û Evdîlqadir Hesên Nazî hene. Di berhema Zeynep Yaş a bi navê *Şakarên Muzîka Kurdî* (2015a; 2015b) da derbarê jîyan, dengbêjî û kilamên Cemîl Horo da bi berfirehî agahî hene. Herwiha, di sala 1976ê da rêxistina UNESCOyê Elî Tico vedixwîne Fransayê, Elî Tico pênc salan li Fransa û Hollandayê dimîne û di vê maweyê da kilamên wî hatine tomarkirin (Yaş, 2016). Xebata Barbara Sträuli ya bi navê *Dewrêşê Evdî- Dewresh, Son of Evdî, A Kurmanji Epic as Performed by the Berazi Singer Baqî Xido* (2017) (Dewrêşê Evdî-Dewrêş Kurê Evdî, Destana Kurmancî ya Ji Aliyê Stranbêjê Berazî Baqî Xido va) û gotara bi navê “Di Navbera Nerît û Teknolojiyê da: Jîyan û Hunera Kilamcî Elî Dore” (Sürücü, 2024) jî ji wan xebatên li ser dengbêjên herêma Berferatê ne.

Armanca vê xebatê ev e ku lêkolîna jînenîgarîya Hemgulî bike, derbarê dengbêjiya wî û berhemên wî da agahiyên berfireh pêşkeş bike. Ji bo ku armanca xebatê pêk bê, bi xizma, nas û dostên Hemgulî ra hevpeyvîn hatin pêkanîn. Bi rêya van hevpeyvînan li ser biyografî, kilambêjî, kilamên dengbêj Hemgulî lêkolîn hatin kirin. Herçiqas li herêmê gelek dengbêjên navdar hebin jî jîyan û berhemên kêmbêjên ketiye nav lîteratûrê. Lê bi saya qeydkirina kilamên ku Hemgulî dibêje, pareke biçûk be jî sermiyana dengbêjên herêmê hatiye parastin. Wextê ku jîyan û berhemên dengbêj tîr lêkolînkirin bere bere reng û dirûvê çanda dengbêjî û sermiyana dengbêjan a li herêmê jî derdikeve meydanê. Ev jî dibe ku rê li pêşîya lêkolînanê folklor û çanda kurdî/kurmancî veke.

Ji bo ev xebat bigihije armanca xwe bi xwarziyên Mecîdê Hemgulî, Adil û Loqman Xerza

<sup>1</sup> Ji ew bajar, bajarok û gundên ku dikevin hewzeyaya Çemê Feratê ra Berferat tê gotin. Bajarê Meletî, Elezîz, Semsûr, Riha û Efrînê dikevin vê hewzeyê û wekî Herêma Berferatê tê binavkirin.

ra, bi Mistefa Reşîd ra, bi tembûrvan Wehîd Xelîl û xwediyê kanala *Youtube*ê “Cindires” ra hevpeyvîn hatin kirin. Berî hevpeyvînê pirsên wekî “Mecîdê Hemgulî kî ye, ji ku derê ye, çawa dest bi dengbêjiyê kir, çend kilamên wî hene û hwd.” hatin amadekirin. Ji ber ku ev kesên behsa wan hat kirin li welatên cuda yên Ewropayê dijîn, hevpeyvîn bi rêya kanalên medyaya civakî hatin kirin. Herwiha, hevpeyvîn hatin qeydkirin û peyra hatin deşîfrekirin. Ji ber ku kesên ku me bi wan ra hevpeyvîn kirin nêznasê Hemgulî ne, ew bûn alîkar ku biyografi û berhemên dengbêj bîn nivîsandin. Li pey biyografi û danasîna Mecîdê Hemgulî, behsa bandora dualî ya dengbêjên herêmê hat kirin. Herî dawî, ji berhemên dengbêj, destana “Mihemed Emîn (Leyla û Mecrûn)” hat bernivîsandin, derbarê varyantên devkî û nivîskî yên berhemê de agahî hatin dayin.

### 1. Jiyana Mecîdê Hemgulî

Mecîdê Hemgulî di sala 1922yê da li gundê Gazê ya li ser Tilifa Efrînê ji dayik bûye. Gazê gundekî kevnar e li Çiyayê Kurmênc (kurddaxê). Navê kalê Mecîd, Mihemedê Hemgulî ye, navê bavê wî Mûrad e ku ew ji malbata Hesên Efendiyan nin. Navê diya wî Zeyneb e (Zeyneba Evdê Osê). Pênc xwişk û sê birayê wî hene, Hemgulî mezinê birayan e. Ew di zaroktiya xwe da li Tilifê diçe cem xoceyan, hînî xwendin û nivîsandinê dibe. Wê demê zimanê xwendin û nivîsandinê ku li mizgeftan hînî zarokan dikin Osmanî (Eskî Tirk<sup>2</sup>) ye (Hesên, 2024; A. Xerza, 2024; L. Xerza, 2024). Hemgulî piştî xwendina li cem xoceyan, tevî Cemîl Horo dibe murîdê Şêx Xelîl, ev qasî salekê dewam dike û bi kuştina Şêx Xelîl ra murîdiya wî jî diqede (Hesên, 2024; Xerza, 2024a; Xerza, 2024b).

44

Malbata Hemgulî ji mêj va malbateke dewlemend e. Ji ber gengeşiya siyasî li herêmê xizan dibin. Wextê eskerên Fransayê tîn herêmê, bavê Hemgulî dibe milîsê artêşa îngilîzan, diçe Maltayê, li wê derê cara duyem dizewice û heta dawiya emrê xwe li Maltayê dimîne. Wextê wefat dike mesûliyeta malê dikeve ser milên Hemgulî (Xerza, 2024a; Xerza, 2024b). Ji ber ku rewşa wan a aboriyê baş nîne, mecbûr dimîne di karê betonê û gelek karên din yên zehmet da bixebite.

Hemgulî bi Zeynebê ra dizewice. Zeyneb qîza Mihemedê Hebîb e. Ji vê zewacê sê law û pênc qîzên wan dibin. Navê lawan Ednan, Mihemed û Evdirehman e, ji lawan Evdirehman sax e, li Hewlêrê dimîne. Ji qîzan dudu mirine sisê sax in, Cîhan, Nûrhan, Heyat. Hemgulî piştî zewaca xwe jî demekê di karê betonê da dixebite, peyra li Helebê qehwexaneyeye vedike û li wir dixebite. Di sala 1975ê da mala xwe dibe Şamê (Xerza, 2024a; Xerza, 2024b).

Mecîdê Hemgulî di dawiya emrê xwe da bi nexweşiya şekir dikeve, nexweşî lê giran dibe, ewil pêçiyên lingê wî paşê jî ling heta kabê jêdikin (Xelîl, 2024; Xerza, 2022). Hemgulî di sala 2007ê da, di 85 saliya xwe da li Helebê wefat dike. Gora wî li Tilifê ye.

Mecîdê Hemgulî mirovekî welathez û milethez e. Xwarzên wî ji bo wî dibêjin “Xalê me di gund da merivekî zerarsiz bû. Hezkiriyê miletê xwe bû, gund gî jê hez dikirin. Qîmet didanê. Însankî mehbûb bû” (Xerza, 2024a; Xerza 2024b). Tembûrvan Wehîd Xelîl ku ji Mecîdê Hemgulî ra li tembûrê daye, wiha diyar dike: “Mecîd bi herbî bû bi hûd bû, o muhîd bû; wek behr bû taliya gendî<sup>3</sup> tune bû. Merivekî qebadayî bû, tiştê kêma liyaqê xwe nedidî. Peya bû. Kilamcî bû. Kî çax mir Mecîdê Hemgulî rakirin ser destan” (Xelîl, 2024).

<sup>2</sup> Tirkiya osmanî (Eski Türkçe).

<sup>3</sup> gendî: Wek “kendi”ya tirkî. Li Herêma Efrînê berbelav e.

## 2. Dengbêjiya Mecîdê Hemgulî

Mecîdê Hemgulî di çardeh-pazdeh saliya xwe da kilaman dibêje. Lewra di nav çandeke qedîm û zindî da çavên xwe vedike. Ewî li cem xalê xwe, li cimaet, şevbuhêrik û dawetan hînî kilaman dibe (kilaman radike) (Xerza, 2024a; Xerza, 2024b). Li ku derê dengbêjekî kilamek gotiye, Mecîdê Hemgulî mêvanê wê derê bûye û bal û zêhna xwe daye ser kilamê. Di çardeh-pazdeh saliya xwe da kilaman distrê. Adil Xerzayê xwarzê Hemgulî ku ew jî kilaman dibêje, got ku wî jî miraq kiriye ku xalê wî di çend saliya xwe da kilam gotine. Xerza got min ev jî xalê xwe pirsî û xalê min ji min ra got:

*“Go kilam ez deh û çar salî (14) bûm, mi wekî meraqê girt. Mi ji bo vê meselê xwe boş kir (mi ji xwe ra kir karê xwe-yanî min wextê xwe bi temamî da vî karî). Go mi ji fen<sup>4</sup> û toraz<sup>5</sup> pîr hez dikir. Go e deh û çar salî bûm e tim diçûm ber devî kilamciya. Go e diçûm ber dêv, disekinîm heta sibê. Zemanê berê li Çiyê Kurmanc her gundekî odak hebû, dengbêjê der di wa gundî da kom dibû. Go e qiçik bûm, go e diçûm. Go tim mi qûlaqê<sup>6</sup> xwe dida ser” (Xerza, 2024a; Xerza 2024b).*

Hemgulî li cografyayekê ku lê dengbêj û tembûrvan zêde ne çavên xwe vedike. Xalanê wî Cemal û Mûradê Evdê Osê jî ji kilambêjên serdemê ne. Wekî ku Hemgulî jî di hevpeyvîneke xwe da behs dike, ewî li xalanê xwe kilaman radike<sup>7</sup> (Xerza, 2022). Xalanê wî li Xelnêrê ne, Xelnêr 5 kilometre ji Efrînê dûr e. Mecîd her tim diçe cem wan dibe mêvanê wan, beşdarî şevbuhirkên wan dibe (Xerza, 2022; Xerza, 2024a; Xerza 2024b). Wekî din, Hemgulî bi xwe di hevpeyvînekê da behsa Hemûş Kûrik dike, dibêje ku wî kilama Salihê Naso û ya Cembelî ji wî rakirine; lê zêde dike û dibêje: *“Me Hemûş Kûrik nedî. Cemîlê Huseynê Kerrê didayê, mi ji wî rakirin ev kilama” (Xerza, 2022).*

Wextê Hemgulî nûciwan e, li herêmê du dengbêjên bi nav û deng hene, ji vana yek Evdê Şerê, yê din birayê wî Hesên Nazî ye. Him ji kilamên ku Hemgulî distrê him jî ji agahiyên tembûrvan Wehîd Xelîl em fam dikin ku Hemgulî van dengbêjan nas dike. Hemgulî bi xwe jî ji Xelîl ra dibêje:

*“Ê go Ebû Xelîl, Evdê Şerê biçûya kîjan gundî (eyb olmasin<sup>8</sup> kerê xwe hebû), go e diçûm wî gundî. Eva kal (Mecîdê Hemgulî) bi min ra wer dibê. Dibê ku Evdê Şerê biçûya kîjan gundî, e diçûm wî gundî. Mi dibihîst li ku derê ye e diçûm. O e dihatim yek niqla Naza jî cem gendî mi xwew dikir, o go eva jî bi qedrê îlahî ye. Xwedê mêjîk daye min, gî Evdê Şerê bigota çî, da kilama Memê şeş saeta heft saeta kilama Memê go, wekî şîridê bisecirînî go e gî disecirînîm. Eva Mecîdê Hemgulî mi ra wer dibê. Ê mi go saeta te xwaş” (Xelîl, 2024).*

Wekî ku ji axaftina di navbera Wehîd Xelîl û Mecîdê Hemgulî da derbas dibe tê famkirin ku li aliyekî xalanê wî, li aliyekî kilamên Hemûş Kûrik û li aliyê din jî Evdê Şerê û Hesên Nazî hene. Wextê em bala xwe didin repertûara Hemgulî jî ev bi zelalî xuya dibe ku repertûara wan dişibe hevdu. Heta piştî ku kilamên Hemgulî tèn qeydkirin, rojekê li gundê Naza ji bo muxtar didin ser plakê, muxtar dibêje ev yê distrê Evdê Şerê ye?

4 fen/fan: Çand û huner, bi erebî karê hunerê. Fennan xwedanê hunerê.

5 toras: Folklor, çand û huner. Tiştê kevin kelepur folklor. Çi berhemên kevin hebin dikevin vê kategoriyê.

6 qûlaq: Guh

7 rakirina kilaman (kilamrakirin): Ji dengbêjekî hînbûna kilaman re tê gotin.

8 Bila eyb çênebe (heşayî haziran).

“Kilamê gendî gi ê Evdê Şerê ne. Ne zêde dikê ne kêr dikê. Wana distrê. Kasetê Mecîdê Hemgulî me disecirand, Fêrhed digo xalê Wehîd ha ji te ra va şîrîda, Xalê Mecîd ha ji te ra vê şîrîdê. Eva hedyâ dida, me dibir. Me mi muxtarê gundê Naza (e bi xwe ji gundê Naza me-Wehîd Xelîl) me. Me ji mixtar ra dênî ser; muxtarê gundê me pismamê me ye, o mi ji yekî din ra jî dîna ser hew jî bi omrê muxtar e, evana gihîştine Evdê Şerê, go pir golê Evdê Şerê ne. Golê nanê vana gulê nanê, go eva Evdê Şerê ye. Go ne şorekê kêr dikê o ne zêde dikê. Mi go ev kilamana gi ji Evd rakirine. Go doxrî ye” (Xelîl, 2024).

Di mijara tesîrê da dikare bê gotin ku Hemgulî ne tenê ketiye bin tesîra xalên xwe, dengbêjên navdar ên herêmê Hemûş Kûrik, Cemîlê Evdê Kerrê, Îbrahîmê Tirko, Evdê Şerê û Nesên Nazî lê tesîr kirine. Çawa ku dengbêjên berî wî û hevdemên wî lê tesîr dikin bi wî awayî ew jî tesîr li dengbêjên serdema xwe dike. Hemgulî di serî da li Eliyê Kapê, Cemîl Horo, Elî Tico, Bavê Selah û gelek dengbêj û mitribên hunermend ên li herêmê tesîr dike. Hemgulî di hevpeyvîneke xwe da dibêje: “Cemîl Horo hê zarok bû, dihat cem me. Em bi hevdu ra digeriyan, em bi hevdu ra diçûn dawetan, ku ez li cimaetekê bistrîyama wî digo ez nasitrêm. Min digo bistrê kilamê tu pê dî<sup>9</sup> e nadimê” (Xerza, 2022). Ji tevgerên Horo tê famkirin ku ji hosteyê xwe hez dike û jê ra rêz digire (Xelîl, 2024). Dîsa di berdewamiya vê hevpeyvîne da Hemgulî behsa Eliyê Kapê dike, dibêje: “Ji min ra dida tembûrê, ji min elîmî kilama. Ez diçûm kîjan cimaetî bi min ra dihat ji min ra lê dida û ji min kilam rakirin” (Xerza, 2022). Pey Cemîl Horo çiraxê herî zêde behsa wî tê kirin Elî Tico ye. Tico tim diçe cem Hemgulî ku hînî kilaman bibe, lê wekî ku Hemgulî û xwarzên wî Loqman û Adil jî behs dikin, Tico nikaribûye kilaman rabike: “El Tico şeş meha mi jê ra dida kilamê Meyremê, Meyrema Miho Begê nikaribû rakira” (Xerza, 2022). Elî Tico li cem xwe dikir ser kilama, kilam ku tu li cem xwe bikî ser winda dibin (Xerza 2024a; Xerza, 2024b). Dengbêjekî din ku divê behsa wî bê kirin Bavê Selah e ku ji kilamên wî eşkere ye haya wî ji Hemgulî heye.

“Gi Mecîd bes bistrîya e bi xwe bi dalga diketim (yanê wextê Mecîd distrê ji xwe diçin). E hunda dibûm. Xêr e. Qulakê min li ser şora ye, ê kê Mecîd bê çî: Kilamê Delêl sitra yî, Ebû Selah rehetî sitrayî. Mesela Ebû Salah can e o Mecîdê Hemgulî omrê xwe heştê sal e gulê nayê. Ebû Selah ew Ebû Ednan yekî yezîd hatin cem e mal. Go tu kê kilamê Delêl ê Hemgulî ji me ra bê. Ew herdu jî xweş in. Evdoyê Muxtêr o lawê muxtarê Naza ew jî mewcûd bûn. Ebû Selah mi dî çip çip çip êstira berdidê, yaw go eva te ji ku girtiye, me go eva Mecîdê Hemgulî ye. Go mi pê bihistîye eva Ebû Selah” (Xelîl, 2024).

Di çanda dengbêjiyê da rizxwarin, garisxwarin zêde dernekeve pêş jî heye. Ji bo Hemgulî tê gotin ku di xewna xwe da riz xwariye. Wekî ku ji vê anektodê jî tê derxistin hafizeyeke xurt a Hemgulî heye û bi carekê da hînî kilamê dibe. Kilamekê di derbekê da hifz dike, wate jê wek tenê rizê di mêjî da cih digre (Xerza, 2024a).

“Xalê mi Mecîd carekê ji mi ra hewil da, go çûçik bûm. Li Tilifê dawetik bû, go yek hat da kilamê, go cimaet fere, e jî çîçkî wê da rûniştim. Go da kilamê, go li ser hevdu heta taliyê mi kilam rakir (eger kilam saetkê gotiye, saetik nîvkê, du saet). Heta taliyê him meqam rakiriye him kilam hifz kirîye. Go mi go xalo e dike nake e nikame kilamê te wê gotina te rakim. Dikenî digo xwarzê mi riz di xewna xwe xwariye” (Xerza, 2024b).

Di çanda dengbêjiyê da yek ji nîşaneyên giringtirîn ên hostetiya dengbêj nîşan dide bîra wî ya xurt e. Mecîdê Hemgulî ji wan dengbêjên xwedî bîra xurt e, herçiqaş xwendin û nivîsînê zanibe

9 tu pê dî: tu bibêji (bistrîyî).

jî kilamên xwe jixweber dibêje.

*“Van kilamêd Mecîdê hîfîz kirine ne secirandiye ne yazmîş kirine. Cemîl Horo rehmêtî yazmîş dikir. Ebû Mesûd rehmêtî yazmîş dikir. El Tîco Xwedê rehma xwe lê ke îrtîcalî bû, ji mêjî bû. Mecîdê Hemgulî evana gi di qefesê singê xwe da rakirine o gi hîfîz kirine wek çî ku tu mise-celekî (cîhaza ku deng qeyd dike) bisecirîni di singê xwe da secirandiye, gi ji mêjiyê xwe da bernedayî. O ne bi şora e dibêm, şîrîdîn hene. Bîst şîrîd, sî şîrîd me seciland”* (Xelîl, 2024; Hesên, 2024; Reşîd, 2024; Xerza, 2024a; Xerza, 2024b).

Destana Memê Alana ku Hemgulî vedigêre ji kilamên din cuda dibe, tê gotin ku Hemgulî ev xwendiyê û ji kitebê hildaye. Hemgulî, *“Go em biçûçîk bûm em diçûn ser bêderan li Tilîfê go qiçîkê gund dihatin o mi kitêb ji gendîya ra dixwend. Hé deh û çar deh û pênc salî bû”* (Xerza, 2024a; Xerza, 2024b).

## 2.1. Kilamên Hemgulî

Piraniya kilamên Mecîdê Hemgulî denstanên dirêj in. Di hevpeyvînan da behsa 50-70 berhemên wî bê kirin jî îroroj nêzî 27-28 berhemên wî li berdest in: Hesênê Alê, Dewreşê Evdî, Memê Alan, Êsibê Şer, Eysa Êbê, Arzi û Qember, Ezîzê Tek Mistefa, Gureşê Mêrzo, Cembelî, Delal, Salihê Naso, Melekcan/Meleknaz, Ês û Ezîz, Edla Omer Begê, Tahir Beg, Şêx Seîd, Genç Osman, Fetah Beg, Ema Hemê, Meyremê, Mihemed Emîn... Tê gotin ku Hemgulî kilama Qoçyasîn û Daxdewran jî vedigêre ku kêma kes pê zanin lê ev kilam nehatine qeydkirin. Herwiha, sitranên ku li herêmê berbelav ên wekî Heycan, Zeynebê, Yara Milîsa, Xemê Zalim, Xezala Sêwregê û Xwarzi Mihemed jî straye.

Dengbêj kilamên xwe li şevbuhêrk, dîwanxane, qehwexane, dawet, şahî û li ser mecrayên teknolojiyê îcra dikin. Mecîdê Hemgulî ewil li şevbuhêrk, dawet û şahîyan kilamên xwe îcra kirine. Peyra, digel Cemîl Horo û Ellî Tîco bi ortaxî li Helebê qehwexaneyekê vedikin. Ji ber ku xwediyê qehwexaneyê yekî ermen e jê ra dibêjin *“Qehweya Xirîsto”* (Xerza, 2024a; Xerza 2024b). Ev qehwexane ji bo wan dibe mekanê îcra.

## 2.2. Qeydkirina Kilaman

Li herêma Efrînê bi qasî ku dengbêj navdar in bi wî qasî tembûrvan jî bi nav û deng in. Hin dengbêjên herêmê yên wekî Hesên Nazî û Elê Kapê him li tembûrê didin him jî distrên, hin dengbêj jî digel tembûrvanekî kilamên xwe îcra dikin. Evdê Şerê û Mecîdê Hemgulî ji van dengbêjan in. Hemgulî di hevpeyvîneke xwe da dibêje ku ewil Elê Kapê jê ra li tembûrê dida, piştî ku ew rehmêt dike ew û tembûrvan Wehîd Xelîl hevdu nas dikin (Xerza, 2022). Wehîd Xelîl jî behsa nasîna xwe ya Hemgulî kir û got ku wî nav û dengê Hemgulî bihîstibû, car caran di dawetan da lê rast hatiye û wiha dewam kir:

*“Paşê min Mecîdê Hemgulî artix mi nas kir, lê Mecîdê Hemgulî e ji dûr da nas dikim. Navê gendî heye, navê gendî mi bihîstiyê. E di daweta da dibînim di dîlana da wek Cemîl Horoyê rehmêtî distrê, lê aleqed pir tune ye. Piştî di salê 80-90î da (1980-1990) artix merhebayê min bi Mecîdê Hemgulî ra çêbû”* (Xelîl, 2024).

Wehîd Xelîl wextê Hemgulî nas dike, êdî kalekî 80 salî bûye. Dibêje ku rojekê Omer Fewzî gazî wî dike, diçe Şerqil Ewsed cihê ku kasetan qeyd dikin, li wê derê Hemgulî dibîne. Jê ra

dibêjin ji Hemgulî ra li tembûrê de em ê kilamên wî qeyd bikin.

“E rokê çûm î li cem Ferhad rûniştiye. Mi go tu li ku bû, tu ne li ku bû, tu hunda bû. Wele go ez nikna li Helebê me, wextekê ji min li Şamê rûnişt. Piştî hat cem Omer Fwzî Şerwil Ewsed, Ferhêd go o mi vê ra go birê Wehîd go gerek eva Mecîdê Hemgulî em di şûnê fenanaka kin wek Cemîl Horo, wek Hesnazî, wek Evdê Şe’rê... Ê mi go çima ev meriya ev kala kare bistrê? E zanim di dîlana da distrê, derdikeve lê bes ewê min pê ra tine... Ez û tembûrê xwe em di bin emrê te da ne birê Mecîd. Omrê te heştê sal e. O ezê li kêlekê te bisekinim wek Cemîl Horoyê rehmêtî, wek Ebû Mesûdê rehmêtî le mirinê o fi’len li mirinê e li kêlekê bûm” (Xelîl, 2024).

Piştî ku hevdu nas dîkin ji hevdu naqetin heta ku Hemgulî nexweş dikeve û mirin wan ji hevdu diqetîne. Em ji qeydên Mecîd jî dibihîsin ku wî ji Xelîl pir hez kiriye û dibêje: “*Ti li ku bû hetanî nika, ti li ku bû. Ewr û esman dîceniqî. Mi zêrana perana mi birijandana mi tembûrcî wekî te nedidî. Ti li kalbûnê mi hat o dîsa ezê bin barê te rabim. Dewrêşê Evdî, Delal ti kîjan kilama dixwazî e bistrêm em bisecirînin*” (Xelîl, 2024a).

Hemgulî dixwaze kilamên ku distrê bên qeydkirin, ewil xwarziyê wî Loqman Xerza çendên wan qeyd dike. Lê ev kaset wînda ne. Piştî vê, Omer Fewzî û Ferhad li Şerqil Ewsed dixwazin kilamên Hemgulî qeyd bikin. Lewra naxwazin ev mîrata ku Hemgulî ji dengbêj Evdê Şerê û Hesên Nazî rakiriyê wînda bibe. Wê demê gazî Wehîd Xelîl dîkin ku were li tembûrê bide. Behsa 50-70 kilamî tê kirin lê teqrîben 30 şîrîd (her şîrîdek derdora saetekê ye) tî qeydkirin ku piraniya wan kilaman li ser *YouTube*ê hatine parvekirin (Jindires, 2022; Xelîl, 2024).

Wehîd Xelîl (2024) behsa pêvajoya qeydkirinê dike û dibêje: “*Heta qulqulê dewkewa, qîrîqîrê dikê sibê ez û Mecîdê Hemgulî û Ferhêd em disehirîn*” û wiha dewam dike:

“*Teqrîben berî sala 2000î dest bi qeydê kirin. Pêşniyara Omer Fewzî bû. Hewşîk me hebû, hewşê ereba bû, hewşê mi jî mezin bû mabeynê Şêx Meqsûd Eşrefiyê. Cihazêd Omer Fewzî me anî hatin, min û Ferhêd. Me danî cem me, bi meha li cem mi bû, cihaz ranedikirin. Cihaz li cem gendî pir bûn, ev cihaz tescil pê dikirin. Têlefûn mêlefûn tinebûn. Em diçûn me ban kalê dikir, me dîgo were sibêda filan saetê, were cem Fêrhêd studyo, emê bi hevdu ra herin kilamêkê bisecirînin. Me şevê kilamêk secirand. Ew di kilam me disecirand, me xwe reht dikir*” (Xelîl, 2024).

### 3. Destana Mihemed Emîn (Leyla û Mecer[n]ûn)

Destan yek ji kevintîrîn cureyê edebiyata devkî ye, di serdemên kevin da derketiyê meydana (Kaplan, 2019: 11). Peyva “destan”ê peyveke Îranî ye (Çobanoğlu, 2023: 21). Celîlan ji bo destanê peyvên “epos, epîk”ê bikaranîne (Celîl û Celîl: 2023). Destan ew cure vegêran e ku mehsulên ewil ên ji jiyana koçeriyê ber bi cîwarbûyîna va; li ser mijarên wekî evîn, lehengî û hwd. hatine vehênan (Alptekin, 2021: 18). Destan bi piranî xwedî taybetiyên neteweyî ne, behsa rîwayetekê dike ku ew wekî rastiya tarîxî ya raboriya wan derbas dibe (Vali, 2021: 19).

Destan ji aliyê mijarê va wekî destanên lehengiya mîtolojîk, destanên evînî yên mîtolojîk, destanên lehengiya mêjûyî, destanên dînî, destanên li ser afat û karesatan, destanên evînî yên mêjûyî û vegêranên strankî yên li ser şair û dengbêjan tî dabeşkirin (Subaşî, 2024: 108-109). Li gor senifandina Subaşî destana Mihemed Emîn wekî Arzi û Qember, Tahir û Zarê, Ferhad û



Şîrîn û hwd. di kategoriya destanên evînî yên mêjûyî da cih digire. Ev cure destan bi gelemperî pexşankî-strankî têkel in (Atlı, 2024). Di qismê pexşankî da vegêr serpêhatiyê neqil dike, di qismê strankî da jî leheng diaxifin. Destpêka qismên strankî piranî bi gotinên wekî “go, go lo, go yawrim, digo bavo, gere Mecnûn digo, Leylê digo û hwd.” dest pê dike.

Çîroka bi navê Leyla û Mecnûn ji aliyê gelek helbestkarên Erebi, Farsi, Tirkî, Urdû û Kurd ve wekî çîrokeke menzûm di qalibê mesnewiyê de hatiye vehonandin. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de 14 Leyla û Mecnûn hene (Kurt, 2023: 180). Leyla û Mecnûna Sewadî (sedsal: XVIII) û ya Mela Mehmûdê Bazîdî (sedsal: XIX) hene (Adak, 2018: 1199). Varyantên nivîskî û devkî yên destana Mihemed Emîn hene. Li gorî agahiyên berdest, ji van varyantan, varyanta Le Coq (1903: 47-49) ya bi navê “Destani Muhammed Yemîn” dikare wekî varyanta kevintirîn bê qebûl kirin. Ev varyant pexşankî ye û kêma e. Îskeleta wê dişibe varyantên herêma Efrînê. Di varyanta Le Coq de bi kurtasî bûyer wiha ye. Mihemed Emîn lawê mîrê êlê ye. Mîrê êlê zarokên xwe çênabin piştî jina pêncan tîne Xwedê ewladekê didê. Emrê Mihemed Emîn dibe çardeh-panzdeh, Mîrê êlê dixwaze wî bizewicîne. Lê Mihemed Emîn di xewna xwe da Cebrail, Ezrail, Mukaîl û Îsrafil dibîne ku jê ra dibêjin tu yê şeva gerdekê bimirî. Li ser daxwaza dê û bavê xwe Mihemed Emîn pênc xizmetkarên digre cem xwe ji etegê Sêweregê derdikeve heta Gawir Daxê (Çola Hemqê) tê. Li vir qîza Mîrê Tirka Murseloxli *Gurcistan Guzelê Zelîxe Xatûnê* dibîne vedigere malê ji diya xwe ra dibêje herin ji min ra wê bixwazin. Diçin dixwazin lê ji ber ku Zelîxe Xatûn naxwaze bibe bûka xerîban ji bavê xwe ra dibêje qelenekî giran bixwaze bila nikaribin bidin. Murseloxlu, ji Mîrê êlê qelenekî giran dixwaze Mîrê êlê qebûl dike, Zelîxe Xatûnê ji Mîr Mihemed ra dibin. Mîr Mihemed berî ku here oda gerdekê ji diya xwe ra dibêje şîrê xwe helal bike. Diya wî jê ra dibêje ew xewneke şeva bû, derbas bû çû lê Mihemed Emîn sê saet bi şûn da dimre. Zelîxe dibin li çolê datînin. Destan heta vir e, berdewama destanê tune ye (1903: 47-49).

Celîl û Celîl (2014b) di berhema xwe cih dane sê şaxên destana “Leyla û Mecnûn” (Mihemed Emîn). Ji van şaxa yekem vegêrana Etarê Şero ye ku di sala 1955ê da li Yêrwanê hatiye tomarkirin. Ev varyanta pexşankî-strankî têkel, ji duwazdeh rûpelan pêk tê. Beşên strankî ji çarînan pêk tê. Bi vê taybetiya xwe ji varyantên din cuda dibe. Vegêran di destpêkê da navê destanên evînî yên navdar dibêje û Leyla û Mecnûn jî di nav wan da nîşan dide.

Çi dinyake k’af nûne,  
Yek Memoye, yek Zîn e,  
Yek Ferate, yek Şîrîn e,  
Yek Leyle, yek Mecnûn e. (Celîl û Celîl, 2014b: 393).

Şaxa duyem di sala 1980 da ji aliyê Aslanyan Pêtros hatiye tomarkirin. Ev varyant şazdeh rûpel e. Di vê varyantê da di qismêke dirêj ya vegêranê da behsa malbata Mihemed Emîn tê kirin. Lêbelê navê destanê ne Mihemed Emîn e, Leyla û Mecnûn e. Leyla Qîza Şêxê Ereba ye, Mecnûn kurd e. Şaxa sêyem jî di sala 1981ê da li Komara Ermenistanê ji Egîtê Têcir hatiye bernivîsandin, pênc rûpel e. Navê vê varyantê jî Leyla û Mecnûn e lê di destpêkê da dîsa em dibînin ku Mihemed Emîn heye. Ji bilî varyantên nivîskî ku li jorê hatin behskirin varyantên devkî jî hene ku dengbêjên wekî Mecidê Hemgulî, Hesnazî, Cemîl Cemal Hibo, Evdê Şerê, Ebdal Raof Çawîş vegêrane.

### 3.1. Kurteya Destanê

Ev kurte, kurteya varyanta Mecîdê Hemgulî ye ku me bernivîsand. Varyanta Hemgulî jî ji aliyê îskeletê ve dişibe varyantên nivîskî û devkî yên ku me li jorê behs kirin.

Ûzin Beg mîrê yaylê ye, sê jinên wî hene, zarên wî çênabin, diçe jina çarem jî tîne. Mal û milkê wî pir e, destê xwe li ber Rebbê alemê vedike, dia dike. Xwedê neh meh, neh saet, neh deqîqe şûnda lawekî didê. Ûzin Beg hemî eşîrê kom dike, bîst û çar beranan serjê dike, ziyafetê dide û jî eşîrê ra dibêje navekî li lawê min bikin. Nav lê dikin Mihemed Emîn (te lawê bi tenê). Zeman derbas dibe, Mihemed Emîn dibe şeş heft salî, bavê kal wî dişîne mektebê. Wextê Mihemed Emîn dibe çardeh pazdeh salî bavê wî diçe jê ra dibêje ez dixwazim te bizewicînim. Mihemed Emîn ji ber ku hêj sî û sê kitêbên mektebê xitim nekiriye dibêje ez naxwazim bizewicim lê nikare emrê bavê xwe jî paşda vegeşîne. Hema li Rihîl Bozê siwar dibe û sê roj û sê şevan diçe. Rêya xwe winda dike, di rê da li kalekî rast tê, kal berê hespê wî vedigerîne rê. Ji Mihemed Emîn ra dibêje ez qelawîzê felekê Ezraîl mîrê mewtê me. Wê çaxê Mihemed Emîn jê dipirse: çiqas emrê min maye. Ezraîl (kal) jê ra dibêje şeva gerdekê tu yê rihê xwe bidî. Lê bê çare Mihemed Emîn emrê bavê xwe qebûl dike. Ûzin Beg tevî pênsid siwarî diçe mala begê tirkan Mirseloxlu, Eyne Zelîxaya begê tirka ji lawê xwe ra dixwaze û tîne. Şeva erdekê Mihemed Emîn dimire, Ûzin Beg vê keçikê dide destê çend mêran, dibêje bibin bikujin, kirasê wê yê bixwîn ji min ra bînin. Eyne Zelxê dibin datînin çolê vedigerin. Neh mehên Eyn Zelxeyê diqedin lawekî wê dibe, nav lê dike Mecnûn. Heft salan li çolê dimîne, rojekê diçe gundekî, li wir tevî lawê xwe dibe şivanê mixêr. Şevê Mecnûn di xewna xwe da qîza Şêxê Zirkan Leylayê dibîne, ji ber eşq û mihbeta wê bi çolan dikeve, heft salan digere. Rojekê tê ser kaniya Rasûl'eynê, Leylayê dibîne, herdu aşîq digihên hevdu. Mecnûn serê xwe dide ser çokên Leylayê dikeve xewê, Leyla mecbûrî vedigere malê. Wextê digihe malê dibîne ku kon bar kirine diçin. Dike nake diya wê destûrê nadê ku vegere ser kaniyê (Jindires, 2022).

Vegêrana Hemgulî li vir bi dawî dibe, lê wextê em varyantên din ên Mihemed Emîn dixwînin (bo varyantên nivîskî bnr. Celîl û Celîl, 2016b: 392-415) û guhdarî dikin fam dikin ku herdu aşîq di encamê da dimirin, dibin du stêrkên li esmên ku ev jî dirûvê efsaneyê dide destanê.

#### Encam

Mecîdê Hemgulî yek ji dengbêjên xwenda yê herêma Efrînê ye ku di peywenda hoste-şagirt da gihaye. Ewil li cem xalê xwe Elo û Mûrad li şevbuhêrkan, peyra li dawet û şahiyên hînî stran û destanan bûye. Paşê, guhdarî dengbêjên herêmê yên wek Hemûş Kûrik, Evdê Şerê, Hesên Nazî, Îbrahîmê Tirko, Cemîlê Evdê Kerrê dike û kilamên wan radike. Dikare bê gotin ku çiraxê Hesên Nazî ye ku piraniya destanên ku vedigêre sermiyanê wî ne. Hemgulî çawa ku li cem dengbêjên hoste yên serdema xwe hînî kilaman dibe wisa jî ji dengbêjên hevçax ra dibe hoste û li wan tesîr dike. Li ser Eliyê Kapê, Cemîl Horo, Elî Tico û Bavê Selah tesîra wî çêdibe.

Mekanên îcrayê yên serdemê şevbuhêrk, dawet, şahî û qehwexane ne. Wê demê teknoloji wekî îro li kar nîne. Di navbera salên 1985-1990î da xwarzê Hemgulî Loqman Xerza kilamên Hemgulî qeyd dike lê ev arşîv winda ye. Di navbera sala 1990 û sala 2002yê da li Şerqîl Ewsed cihê qeydkirina kilaman ya Omer Fewzî hewl didin hemî berhemên dengbêj qeyd bikin. Fewzî qasî 30

şirîdî qeyd dike ku ev berhem bi saya teknolojiyê hatine parastin û îrroj derfeta bernivîsandinê dide me.

Hemgulî yek ji wan dengbêjan e ku riz xwariye. Lewra peyvên kilamên wî wek hebên rizê li dû hevdu rêz dibin. Zimanê wî zelal û fambar e, di berhemên wî da şopên devoka herêma Efrînê û peyvên erebî-tirkî tîn dîtin. Li gorî çavkaniyan, dengê wî dengêkî bi hêz û dewamdar e ku dikare bi saetan bistrê. Lewma kasetên wî yên ku sê saet û nîv, çar saet û nîv dikşînin hene. Wextê kilamên wî tîn guhdarkirin jî hêza dengê wî tê hîskirin. Li gorî rûdana bûyerê deng bilind dibe, dikeve, zîz û qalind dibe. Di hevpeyvînan da tembûrvan Wehîd Xelîl (2024) jî ji bo dengê wî dibêje, dengêk wisa li ser e ku wextê distra “esmên û dengiz dihezand”. Taybetiyeke din a Hemgulî ew e ku digel tembûrvanekî berhemên xwe îcra dike. Ewil Elê Kapê jê ra li tembûrê dide peyra jî digel tembûrvan Wehîd Xelîl distrê.

Repertuara Hemgulî piranî ji destanên wekî Dewrêşê Evdî, Ês û Ezîz, Memê Alan, Cembelî, Arzi û Qember, Mihemed Emîn, Êsibê Şer, Eysa Êbê, Ezîzê Tek Mistefa, Salihê Naso, Melek Can/ Naz û Edla Emer Begê pêk tê ku li cografyayeke berfireh tîn vegêran. Herwiha, stranên kurt ên weke Zeynebê, Meyremê, Heycan û Xwarzi Mihemed jî vegêraye.

## Çavkanî

- Adak, A. (2018). “Analîzeke Kodikolojîk li ser Leyla û Mecnûnên Sewadî, Bazîdî û Fuzûlî di Koleksiyona A. Jaba ya Destnivîsên Kurdî de”. *Şarkiyat*. 10/3 (Ağustos) 1197-1222. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.443978>
- Alptekin, B. (2021). *Halk Hikayelerinin Motif Yapısı*. 11. Baskı. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Atlı, H. (2024). “Destanên Kurdî ji Alîyê Taybetmendiyên Dirûvî ve”. *Şarkiyat* 16/1 (Haziran). r. 488-501. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1437047>
- Celîl, O., û Celîl, C. (2016a). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 1*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê - Wien.
- Celîl, O., û Celîl, C. (2016b). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 2*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê - Wien.
- Celîl, O., û Celîl, C. (2016c). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 3*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê - Wien.
- Celîl, O., û Celîl, C. (2023). *Kela Dimdimê: Xanê Lepzêrîn*. Stenbol: Weşanên Wardoz.
- Çobanoğlu, Ö. (2023). *Türk Dünyası Epik Destan Geleneği*, Ankara: Akçağ Yayınları.
- Dezgehê Sema Kurd (2012). *Geştek di Bîrweriya Çiyayê Kurmênc de*. Sûriye: Weşanxana El-Zeman.
- Hatun Sürücü, S. (2024). “Di Navbera Nerît û Teknolojiyê da: Jiyan û Hunera *Kilamcî* Elî Dore.” *Kurdiname* (11), 75-95. <https://doi.org/10.55106/kurdiname.1536260>

- Hemkoçer, M. C. (2013). *Bêrîvana Cindî: Çend Destan û Serhatiyên devera Efrînê (Rojavayê Kurdistanê)*. Silêmanî: Enstituya Kelepûrê Kurdî.
- Kaplan, Y. (2019). *Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn*. İstanbul: Nûbihar.
- Kurt, Ş. (2023). “Evînek û Du Mesnewî: Danberheveke Naverokî ya Leyla û Mecnûna Sewadî û Leylâ wû Mecnûna Fuzûlî.” *Mukaddime*. 14(1), 177-194. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1241516>
- Le Coq, v. A. (1903). *Kurdische Texte: Kurmangi-Erzählungen und Lieder*. Berlin: Zweiter Teil.
- Sträuli, B. (2017) - *Dewrêşê Evdî - Dewresh, Son of Evdi A Kurmanji Epic as Performed by the Berazi Singer Baqî Xido*. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.
- Sträuli, B. (2021) “*Our Steppe is Vast ...*”: *Kurdish Epics and Tribal Stories from Urfa, 1906 Collected by Oskar Mann*. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.
- Subaşî, K. (2024). “Ji Mîtojojîyê ber bi Tarîxê û ji Lehengîyê ber bi Evînê Destan Weku Çemkeke Sîwan di Vegêrana Gelî da”. *Şarkiyat*. 16/1 (Haziran), 104-116. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1425264>
- Vali, S. (2021). *Şahnameya Kurdî: Rustemê Zal û Heft Xana Wî*. İstanbul: Avesta.
- Yaş, Z. (2015a). *Şakarên Muzîka Kurdî 1*. Amed: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin.
- Yaş, Z. (2015b). *Şakarên Muzîka Kurdî 2*. Amed: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin.
- Yaş, Z. (2016). Elî Tico. *Folklorê Kurda*. Jimar: 7.

### Çavkaniyên Online

- Luqman Xerza. (2022, February 5). *تاس درك عم يل كهم ح دي جم نان فلأ* [Video]. YouTube. [https://www.youtube.com/watch?v=XHcJ9\\_MaxC4](https://www.youtube.com/watch?v=XHcJ9_MaxC4)
- Jindires. (2022, January 6). *نۆن جم لیل ن یم دم جم* Mehmed Emîn: Mecîd Hemgulî [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=M3FKnciioe0>

### Hevpeyvîn

- Xerza, A. (2024a, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.
- Xerza, L. (2024b, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.
- Xelîl, W. (2024, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.
- Reşîd, M. (2024, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.
- Hesen, A. (2024, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.

## PÊVEK

### Mecîdê Hemguli - Mihemed Emîn (Leyla û Mecnûn)

(tembûr)

Merheba gelî guhdaran, em dîsa rûniştine mala birayê me Wehîd Xelîl bavê Xelîl, tembûrciyê zemên. Tembûrciyê eslî eslî mayî nikna<sup>10</sup> çiyayê me kurmanc da Wehîd Xelîl e. O pir dengbêja û tembûrvaniya pê ‘ihtîraf<sup>11</sup> kir. Wek Cemîl Horo, wek ‘El Tico, wek Hesenê Nazî o ê tembûrcî jî wekê Adîkê bavê Hênan ji Kora, wekê Beytêz wek Seîd ko giya jê ra ‘îtiraf kir ku rast didê tembûrê. O li ser cîhaza jî lawê ‘Omer Fewzî biçûk Istaz Ferhad mihendizê ser cîhaza, ew nokna wî jî xwew li xwe herimandî wek me xizmet miletê kurd dikê. O êk ji we ra bibêjî hewalde tarîxê kurd ê ji zemanê berê ji bav û kala da mane hundabûne artiq. Lê em ê ji we ra nikna aşlekin<sup>12</sup>, ‘ecerlemîşkin<sup>13</sup> bila milet pê bi’elimê<sup>14</sup> bila winda nebê. Bavê Ednan Mecîd ji Tilifê, em ê niha ji we ra bibên kilama Mihemed Emîn telayê bi tenê.

(tembûr)

nema dilî min dibêêê  
nema dilî min dilewa dil dibêêê  
dalga dilî min radibe vê êvarê  
li fena pêla behrê tîra dengizê<sup>15</sup>  
di ser hevra diqulibê dere û tê û danêêê  
Xwedê dînê dînenê mala Êzin Beg mîrê yaylêêê  
erê erê Êzîn Beg sê jina tîne Xwedê ti zûret û ewlada nadiyêêê  
tîne jina çarê dîsa Xwedê ti zireta nadiyêêê  
erê erê sibak ji sibê îniyê a meqbûle li ba Rebbî ‘alemê  
Êzîn Begê bi dest xwe kirî misînê avê avdast dikê û tehret dibê  
gere berî xwe diftlîne Beytul mukere malê Xwedê  
çar ri’kat limê dikê destê xwe vedigre li ber Wahidil Qehar yekê bi tenê  
dibê elaaa ma’lûme malê min pire li dinyê  
Xwedêyo tu bi me de ziretikî ewlada nêrlî î xêrlî î çê  
erê malî min pire bila nebe yaxme û talanî xelkêêê  
gere biranoo dem û dewrano digere be’dilê<sup>16</sup> diqulubêêê  
wextanî nehe mehe nehe roj tamam dibe  
dîsa sibakê ji sibê îne Êzîn Beg bi dest xwe kirî misînê avê  
carikê balê xwe didiyêêê  
gerê şewq û şemedanikê daye hêlê heramiyê  
bi dengêkî ban dike li helaliya xwe ya mezin Elîvîstanê

dibê lê lê helalê nema dilê min dilewa dil dibê

10 nikna/nokna/nakna (nûke): niha, aniha. Dema niha.

11 ‘ihtîraf kir: erê kir, qebûl kir, li xwe mikûr hat.

12 aşle kirin: nûkirinek pêşketî (pêşxistin).

13 ‘ecerlemîşkin: ecer nû, ecerlemîşkirin yanî nûkirin (li herêma Efrînê tê bikaranîn).

14 bi’elimê: fêrbûn, hînbûn.

15 dengiz: “deniz” tirkî ye, di kurdancî de “behr” e.

16 be’dilê: peyveke erebî ye, di şûna “pişt ra” da hatiye bikaranîn.

helalê balê xwe didimê tu mûm û şemadanê vêneketine li hêla heramiyê  
 tu ro hilnehatî şewq û şemadanê dayî heramiyê  
 ew çî roniyê xuyan têêê  
 de were mino helala mezin Elîvistanê  
 digo lo lo helalî min î vê dinyêêê  
 Xwedê kire mirazê te Xwedê bike mirazê cim'î ometêêê  
 erê erê Xwedê dayê te ewladikî nêrlî î xêrlî î çê  
 artix<sup>17</sup> mal û mewalê te nabê kisib û yaxme û talanê xelkêêê  
 de were mino Êzîn Beg mîrê yaylêêê  
 radibe ji ser dar û meqamê limê  
 dikeve kozê bîst û çar berana vediqetînê  
 erê erê dide berî kêrêêê êl û eşîrê tekîf dikê  
 qûndaxa beşîgê biçûk radike tîne didîne ortê ortê  
 de were mino vê yekêêê  
 dibê navikê ji min ra lêkin li vê dinyêêê  
 erê dibê navî xwe Mihemed Emîn telayê bitenê  
 beytul miskîn Wehîdil Qehar bi tenêêê  
 sê guliyê ber dilê Rebbî 'alemê nazliyê ber dilê dê û bavê de lorê  
 yawrim<sup>18</sup> yawrim Emînê min yawrim

(tembûr)

54

nema dilê min dilewa dil dibêêê  
 kekê wextê be'dîlê diqulibe dere û tê  
 gerê malê min danî Êzîn Begêêê  
 salê Mihemed Emîn şeş in ketiyê heftê  
 jê ra hucra û mektebekê digrê  
 erê erê Mihemed Emîn telayê bi tenêêê  
 gere kekê dikeve hucrê û mektebê  
 erê artix wext û me'dîl û zemanî derbas dibê dere û tê  
 salê Mihemed Emîn çarde ne pê kirî panzdê  
 erê de were mino Êzîn Beg mîrê yaylêêê  
 derê destî xwe didê qapiyê<sup>19</sup> hucrê îçê hucrê da dinêrê  
 erê Mihemed Emîn telayê bi tenêêê  
 sikiniye li ser darê meqamê limê  
 wextanî silavê vedidê li ser piyê rastê diftilê ser piyê çepê  
 balê xwe didiyê bavikê kal bi riyê spî destî xwe daye qapiyê hucrêêê  
 erê Mihemed Emîn digo lo bavo lo bavooo  
 dilê min dibê û dil dibêêê  
 xêr e vê sibê tu gunê xwe bi ustiyê mi dixî xêr e tu derbas nabî îçê hucrê  
 Xwedê dîne dînenê mala Êzîn Beg mîrê yaylê

17 artix: "artık" peyveke tirkî ye, di şûna peyva "bes, êdî" ya kurmancî da hatiye bikaranîn.

18 yawrim: "yavrum" tirkî ye di şûna "lawê min, keça min" de hatiye bikaranîn.

19 qapî: "kapı" peyveke tirkî ye, di şûna peyva "derî" de hatiye bikaranîn.

digo yawrim yawrim yawrim Emînê min yawrim  
dilê min dibê û dil dibêêê  
ez kê vê sibê ji te bikim minetikê  
eger tu kê minetê bavê kal bigrê kê derbazbim îçê hucre  
eger tu nagrê yawrim ku e netêm îçê hucre  
digo bavo tima tu zanî ku ez nemînim de bajo derbazbê îçê hucre  
bavo ‘emr û dêdigiya te çî ye tu yê bi mi ra bibiyê  
go yawrim nema dilê min dilewa dil dibêêê  
oxlim eger tu kê minet û ricê bavê bigrêêê  
tu kê destî xwe dîne ser qîzikê mêra qîzikê xelkê  
yawrim mal û mewalê min pir e li dinêêê  
belkî Xwedê ziret û ewlada bi te dê  
mal û mewalê me nemîne ne bi ê kisib û talanê xelkêêê oyyy  
yawrim Emînê min yawrim

(tembûr)

gerê Emîn diftilê ku ez nemînim li bavê kala vê sibêêê  
digo bavo dilî min liyan e dilî min liyaneee  
bavo eva dem û dewraneee  
bavo bilbil aşiqî darî gulan e  
ê lo bavooo ‘emrî min çarde ne pê kirine panzda nee  
bavo ku ez nemînim hîn min têrikê xitim nekirî sîh û sê kitabê sîniyane  
bavo ji min bigere ne wexta min û eksîk û ‘eyanê jinan e  
gerê malê min danî Êzin Begêêê  
yawrim dilê min dibê Emînê min dilê min dibêêê  
yawrim eger ti minet û ricê bavê nagrêêê  
yawrim li wê dinê li axretê terezî mezîn dakeve erdê heft sahebî heqê xwe bistîne  
yawrim ku ezê destê xwe di yaqê te kim heqê xwe ji te bistînim li wê dinyêêê ooooy  
erê erê Mihemed Emîn çiqasa dibêse çarê nabîne ji bavê kala Êzin Begêêê  
erê radibê bi qehir ji ser dar û meqamê limêêê  
xwe berdidê yanî tewlê jê bi derdixê Rihil Bozê  
nav û tenga dişidîne lingê xwe diavê zengîyê diqulibê li xaniyê zînêêê  
bervî xwe diftilne çol û kerbelê diqetîne kefê û yazê dikeve deşta Rihê lêêê

(di vê navberê da ji cimaeta guhdaran yek dibêje: ha ha ha...!)

erê erê de were mino vê heywanêêê  
serî sitandiye ji Mihemed Emîn telayê bi tenê  
nikanê biftilîne belêkêd berfê pozê yaylê wetanê dê û bavê  
erê erê Mihemed Emîn telayê bi tenê  
simêlê hûrê şikîne serî lêvê  
hûrik hûrik îstêra bi ser rûçikê xwe da berdidê

de were mino li wê daxê<sup>20</sup> li wê demê  
balê xwe dayê kalik li pêşiyê çow bi dest da sekinye li pêşiyê  
wextanî derbasbûna heywanêê  
gerê kal digre bi serî Rihil Bozê jê ra diskinîne  
gere dibê Emînê min yawrim lo yawrim  
Emînê min yawrim yawrim telayê bi tenê  
yawrim te xêr e simêle te hûr e şikîne serê lêvêêê  
xêr e tu hûrik hûrik êstira bi ser xwe da berdidê  
erê Mihemed Emîn fitilî li kalêê  
go apo nema dilî min dibê û dil dibêêê  
îro sê ro û sê şev in mi qetandî kepê û yazê ketime deşta Rihê lêêê  
apo vê çol vê ketê serî ji min istandî e nikanim biftilîm wetanî dê û bavê belêkêd berfê  
de wê çaxê kal jê ra serî diftilîne dibê oxir be Emînê min yawrim ji te ra oxir beee  
erê wextanî Mihemed Emîn telayê bi tenêêê  
bi atimê qûrşinikî jê bi dûr dikevê  
dibê wey malê min nekeve nakina min bervî xwe fitiland wetanî dê û bavê  
ma xelk bi min ra nebê kê ji te ra fitilan serî vê (...)<sup>21</sup>  
ser ji nû ve Mihemed Emîn diftilê ser kalêêê  
dibê apo nema dilê min dibê û dil dibê  
apo serî min bi qurbano te serî ji min ra fitiland belekêd berfê wetanî dê û bavê  
xelk kê ji min pirs ke ê nebê kê ji te ra fitiland serî vê heywanê  
apo Xwedê kê vê sibê tê î navî xweyî bimbarek ji min ra heval dêêê

gere digo Emînê min yawriim  
yawrim nema dilê min dibê û dil dibê  
ma tu kê vê sibê pêçkê bi navî min ê bimbarek li dinyêêê  
heger ti li navê min dipirsê bi min ra dibêne qelawîzê felekê Ezraîl mêrê mewtê  
yawrim ku e digirim li çar etrafê dinyê  
bi emrê Rebbî 'alemê ku ez rihê canik û camêra qebûl dikim vê sibê oooy oooy  
erê digo apo ma'dem kî bi te ra dibêne Ezraîl mêrê mewtêêê  
apo nakina ti zanî çiqasa 'omrê min jî mayê li dinyêêê  
gere were mino kalê digo yawrim Mihemed Emînê min yawrim yawrim yawrim  
yawrim nema dilê min dibêêê  
yawrim eger tu nezewicî felek bi te ra biraye hetanî diyarê diyarê qiyametê  
yawrim eger ti bizewicîm  
li şeva bi tenê şeva êrdekê li pêşî koz û perdê li ser doşekê pirsê  
yawrim e te nagînim ti bext û miraza li dinyê  
ku ezê peyabim li ser singî te wa ezê emanetî xwe bibim bi emrî Xwedê  
de lorê de lorê Emînê min de lorê oyyy

(tembûr)

20 li wê daxê: li demê, wê çaxê. (Li Efrînê dax di şûna wê rojê wê demê da tê bikaranîn).

21 du peyv nehatin fêmkirin



gerê nema dilê min dibêêê  
Mihemed Emîn telayê bi tenêêê  
wextanî şorê vê ra dikêêê  
bervî xwe diftilîne belekêd berfê wetanî dê û bavêêê  
gere dîsaaa bi dest xwe dike misînê avdasêêê  
ketî îçê hucre dîsa dike çar ri'ket nimê li boyî Rebbê 'alemê  
erê erê dîsa silavê vedide li ser piyê rastê diftile ser piyê çepê  
balê xwe didiyêêê dîsa bavikê kalo destî xwe dane qapiyê hucreêêê  
di îçê hucre da dinêêê  
gere Mihemed Emîn go lo bavooo lo bavooo  
nema dilê min dibê o dil dibêêê  
lo bavo tu xêre guniyê xwe bi ustuyê min dixê  
tema ti ezinî qey ne aqilî te nagê  
erê erê de were mino Êzin Beg mîrê yaylê  
digo yawrim Emînê yavriim  
Emînê yawrim nema dilê min dibêêê  
yawrim ku ez kê bikin ji te minet û ricakê  
gere yawrim eger tu kê bigrî minet ricê bavê  
ez kê derbazbim îçê hucreêêê  
eger ti minetê min nagrêêê  
yawrim li heşer û mehşerê royê qiyametêêê  
heq sahibî heqê xwe bistîne yawrim  
destê min di yaqê te da ye li wê dinê  
erê nema dilê min dilewa dil dibêêê  
de were mino Emîn telayê bi tenê  
dibê bavooo tema mera bişkîne şorê atê  
li wê ji mera ra cihenim yazmîş dibê  
ê lo baba were ji min bigere ji min û vê yekêêê  
bavo dilê min leyane sê carî leyaneee  
bavo dilê min leyane leyane  
erê erê salê min çardene pê kirine panzdaneee  
lo bavo ne wexta min û eskîk û eyanê jinan e oyyy  
erê erê çiqasa Mihemed Emîn dibêse çarê nabîne li bavê kal Êzin Begê  
dibê bavo de here tu zanîî  
bila bi emr û dêdigiya te be  
mîrin ne carkê dibê li dinyayê  
bavo bila ez herim bimrim serî xwe dînim diyarê rehmetêêê  
de lorê de lorê ooo yyy

(tembûr)

nema dilê min dilewa dil dibêêê  
Mihemed Emîn telayê bi tenêêê

digo bavo nema dilê min dilewa dil dibêêê  
tema mi qetandibû kefê û yazê ketibûn deşta Rihê lê  
erê bavooo min bi çavên xwe dî Ezraîl mêrê kulêêê  
bi mi ra go yawrim eger ti nezewicêêê  
felekê yaman bi te ra biraye heta bedîl û bedîl û diyarê axretê  
yawrim eger tu bizewicêêê  
şeva erdekê şeva bi tenê li ser heft doşekê pirsêêê  
ezê li ser singî te rûnim yawrim ku ez emanetî xwe ji te bistînim bi emrê Xwedê  
bavo dîsa tu zanî bavo tu zanîî  
erê heger mera emrî bavikê xwe bişkîne li vê dinyê  
li wê dinyê cihenim ji me ra yazmîş dibêê  
erê bavo ne mirin carekê dibêêê  
de here emrê te çîye bila bi emr û dêdigiya te bê oyyy  
yawrim yawrim Emînem yawrim yawrim oyyy

(tembûr)

erê nema dilê min dilewa dil dibêêê  
wexta Mihemed Emîn te layê bi tenê  
vê şorê bi Êzin Beg mîrê yaylê ra dikê  
erê Xwedê dînê dînenê mala Êzin Beg mîrê yaylê  
radikê pênsid siyarî fîstanê kinî li kabê şûrê qutî li navê  
erê radikêêê xwe berdide çewligê deşte Hemqê<sup>22</sup>  
xwe bi ser Murseloxlu begî tirka da berdidê  
sê ro û sê şeva rûdinê li periyê odêêê  
erê erê nanî pir e nî'metî dere û têêê  
qehwe pir e xelas nebê  
erê royê çarê Êzin Beg mîrê yaylê  
go law begî tirkano  
nema dilî min dilewa dil dibê  
îro sê rone ketin roja çarêêê  
ku em rûniştine li periyê odêêê  
nanî te pir e xilas nabe dere û têêê  
gere ne nanî te xilas dibê ne jî 'ûrê me pê didirê  
tu qe nabê low low Êzin Begê mîrê yaylawo  
tu li çi digerî ji ku da derî û ku da têtîî  
erê nema dilê min dilewa dil dibê  
de were mino bego tirka Murseloxlu vê sibê  
go low low mîrê yaylawo  
eyba reş e fediya giran e li dinyêêê  
e kê çow bi te ra bibêm ti ji ku da tê yo ku da derê  
gerê go low low begî tirkaow  
nema dilê min dilewa dil dibêêê

---

22 Hemq:Deşta Amîk (Amîk Ovasî).

ku ezî hatime di ser te da rûniştîme li periyê odêê  
seb xatirê eksîk û ‘eyanîk jina li dinêê oyyy de lorê de lorêê

(tembûr)

gerê nema dilê min dilewa dil dibêê  
wexta Êzin Beg vê şorê bi begî tirka ra dikêê  
begî tirka lo mîrê yaylaow tu yê bi mi dî firsendê saetikêê  
hetanî derbas dibim hêlê heramiyêê  
erê erêê de were mino begî tirka Mirseloxlû vê sibêê  
dikeve hêlê heramiyêê  
dibê yawriim yawrim ‘Eyne Zelîxa mi yawriim  
erê yawriim dilê min leyaneee qîza min leyaneee  
yawriim Êzin Beg mîrê yaylaneee  
îro sê rone ketî mecalê çaraneee  
yawrim li periyê odê rûniştîye bi pênsid peya di ser kokimî bavikê te da ne  
erê yawriim destî te dixwaze ji Mihemed Emîn telayê bi tenê ra ne  
de yawrim bi mi de cewabkê bavikê xwe ra bikî çî beyane  
erê de were minooo ‘Eyne Zelxê digo bavooo  
lo bavo e nakim lo kalo e nakim e nakim  
e nakim bavo xerîba nakiiim  
tirbê merî xerîbê li ûc e bavo ez nakiiim  
vê yekê bavo ez qebûl nakim  
gerê digo yawriim lê qîza min yawrim  
dilî min liyane tema ketî mecalê sê ro sê şevane  
Êzin Beg mîrê yaylane ranabe ji periyê odê heta nebe sozikê giraneee  
gere digo bavo dilî min tuneee  
bavo dilê min tune sê carî tuneee  
bavo êl û eşîra bavikê min eşîrekê pir mezin eee  
herhal parîk nan tê da heye lîyaqî devê min e  
e nakim bavo ez xerîba nakim ez nakim  
erê erê go bavo dilî min dibêê  
de rabe here bisekine li hizûra mîrê yaylêê  
gerê tê qelengê mi lê dagrê dagrêê  
gerê bila ji ber serî mi birevêê oyyy yawrim yawrim

(tembûr)

erê nema dilê min dibêê  
wextanî ‘Eyne Zelxê bi bavikê ra go  
here bavo tu yê barî min lê dagrê  
bila ji pişt min birevêê  
de were mino begê tirka radibêê  
tê diskine li hizûra Êzin Beg mîrê yaylê mîrê yaylêê

dibê bego nema dilî min dibêêê  
emrî te yê biqedeêê welakîn welakîn  
tu yê bi mi dêêê pênsid siyarî fistanî kinî li navê şûrî qutî li kabê<sup>23</sup>  
erê erê tu yê bi mi de pênsid hêştir û cûdk ez nemînim barî xwe yek bê  
tu pê ra tu yê bi mide pênc hezar mîyê qemer li kelê biharê li serê helbêêê<sup>24</sup>  
erê erê de were mino Êzin Beg mîrê yaylêêê  
lo go begê tirka lo tu kê bi piranî pera mi ji pêş xelkê kîbar birevîniî  
ezê bi te dim pênsid siyarî ku ez nemînim fistanî kinî li navê şûrî qutî li kabêêê  
ezê bi te dim dîsa pênsid mîyê qemer li kelê biharê li serê helbêêê  
ezê bi te dim pênc hezar hêştir û cûdan tevda barê wana li ser bê  
welakîn belkî ti yî time' bî ti qinyatê xwe pê nekêêê  
ezê ji vir da bi tedim heta binyana Besr û Bexdadêêê  
li serî te têkim seredê û dapûyêêê  
de lorê de lorêêê de lorê delorê de lorêêêy  
ê de kekê rê nema li pêşiya Mirseloxlî begê tirka vê sibê  
go bibirin xelkî min î kîbar bibirin qelengî<sup>25</sup> xelkî min î kîbar bibirin  
erê dibirin qelengê xelkê kîbar li vê sibêêê  
xelkî kîbar siyar dîke tod dîke ma'fê bervî xwe diftile pozê yaylayo çiyêêê  
erê erê didê pêşîd koz û perdêêê  
were mino Mihemed Emîn telayê bi tenêêê  
şeva êrdekê şeva bi tenê şeva bext û miraza li dinyêêê  
wextanî dikevê pêşîd di koz û perdê cem xelkî minî kîbar ser heft doşekê pirsêêê  
erê erê wê çaxê balê xwe didiyêêê  
dibê pêşî girtîye Ezraîl mêrê mewtê qasidê felekêêê  
gere peya dibe li ser sîngê Mihemed Emîn telayê bi tenê  
emanetê xwe jê distîne bi emrê Rebbî 'alemêêê  
de werin birano mino vê yekêêê oyyy oyyy oyyy  
erê xeber didinê Êzin Beg mîrê yaylêêê  
xerabê malê Êzin Beg mîrê yaylêêê  
hatê girtê bi qirtikê vê êksîgêêê  
go lawê min sax bû min şande cem te  
te çi anî serî min lawî min vê şevê  
ji berê da dilî te tinebû li lawî min ra li dinyê  
bi zorê pera min ti girtî anî hatî vê derêêê  
de hewal de de hewal de te çi anî serî Mihemed Emîn telayê bi tenêêê oyyy  
de lorê lorê Emînê de lorê lorêêê

(tembûr)

(li vir Hemgulî bi dengê bilind dibêje: bijî bijî bavê Wehîd bijî, bavê Xelîl!)

Ê birano wexta ku Mihemed Emîn serê danî diyarê rehmetê axa gornê bi emrê Rebbî 'alemê.

23 li vir dengbêj xwe şaş dîke.

24 helb: ji bo wexta şîrdadana heywan tê bikaranîn (bêri-helabe).

25 qeleng: qelen, mehr.

Were mîrê yaylê Úzin Begê hat bi qirtikê vê êksîgê girt. Go mi lawê xwe kir cem te xweş bû, tişkî xwe tinebû. Te i bi serî kir? Apo, wele tişt nekir bîle min tişt nekir. Mi çi pê kir? Ê kê xêr e bikujim? Ê go berê dilî te tinebû ti bikî, go herhal bi zorê pera mi ti anî hatî te îşek anî serî. Apo welehî go mi tişteke pê nekir, wekî din Rebbî ‘alemê emrê xwe tamam bû ‘umrê xwe tamam bû, Xwedê bir. Go na te bi serê lawê mi kir. Anî hat, zor peya wesandin, dan destê wan zorê peya, go hûnê bibin herin çiyê bikujin kirasê gêndî<sup>26</sup> di xwûnê da kin ji min ra bînin werin. De were mino va peyana va êksîka dan nav xwe birin çûn kekê şeva li nîvê şevê li nav çiyê kûrê kûrê cin û cinewirê çolê. Yawrim go em kê vê êksîgê xêre bikujin ma bi me çi kiriye? Go va êksîgê çi kiriye? Go wî Mihemed Emîn kuşt, go Mihemed Emîn berê go mi xwewnê da dî ye, go min Ezraîll mêrê mewtê dîye. Go e bizewicim e kê bimrim. Go were emê berdîn. Em berdîn, berdan. Kirasê gêndî jî anîn hatin destmal bû kiras bû anî hatin. Heywanek bi rê va kuştin, bi xwîna gêndî dan anîn hatin.

De bila ewana werin em bihtilin ser ‘Eyne Zelxê. De şev li nîvê şevê kûrê kûrê cin û cinewirê çolê li dorê tê. Eva êksîgê kê ku da here. Hildikşe ser darekê heta sibe lê vetê. Sibe lê vehat efendime soyleyim, gerî li nav çiyê berqefîk<sup>27</sup> dî. Dikeve wê berqefê artix. De heywan, xezal di derdikevin çêrê ev jî pê ra derdikevê çêrê. Heywan çi dixwun ew jî wê ra dixwê. De wexta nehe mehe, neh saet, neh deqîqe qedîyan Rebbê ‘alemê dayê ewladik. Ya îlah ya Rebbî go vî ewladî e kê çi nav lê bikim. Go yawrim ma’dem ku tu yê li vê çol û kerbelê li va derbendêd asê di nav çiyê da di kûr kûrê cin û cinewirê çolê bila navê te jî Mecnûn be. Ê de birano, heft sala ev êksîga li wê derê ma, di nav çiyê da. Wexta dûr e bi şoran nêzik e, heft sal tamam bûn, vî mehsûmî artix bi çayir û çîmenê çolê ma. Îşte wekî heywana diçêre. Rokê ji royê Rebbî ‘alemê go anê nan. De ‘Eyne Zelxê jî gul xana go heyata xwe mi çirimîş kir<sup>28</sup>, va mehsûma di nav vî çiyayî da, di nav cin û cinewirê çolê da ê kê bi’elime çi, ê kê çi şorê bike, ê kê çi yaqîşmîşê<sup>29</sup> însana bibe eva. Qe e nakevim ber gunê vî jî. Go ezê bibim herim nav milet, nav xelkê, nav ‘alemê. Qe nebe bila bi’elime, bila wekê însana bê, li vê derê wekê cinawira ne. De ‘Eyne Zelxê efendime soyleyim, bi desta girt û ket rê. Di vî çiyayî ra di vî çiyayî ra derê. Bala xwe dayê haşa dengê kûçka î tê. Go welehî herhal eva gundek e. Derê derê digihê ber hewşîkê, te’zîye şilfe. Malê malê malê mêrê jinkê derdikevê xwudanê malê! Kî ye ew? Dibê wele ez im. Ez êksîg im. Ê dibê derbas be xuçê, derbas be. Tu çi dixwazî derbas bê. Dibê keko here malê we ra bê bila kevneke kinca ji min ra wîne ez te’zî me. Wele dere hundir mêrik şîr helal e. Divê qîzê êksîgê li ber malê ye dibê ez te’zîme rabe êskîkî jê ra bibe here bila li xwe ke were. De ew jinika êskîkê radike dibe dere efendime soylîyim lê dike tîne tê. Xuçê tu ji ku da tê, tu ji ku da derê, tu kî, tu qîza kê yî, filan bêvan? Dibê wele ez êksîgêk xerîbim kesî min tine. E ji xwe ra li pars marsê digirim. De li cem mêrik dimînê, de mêrik qey ne şîva xwe jê ra dikê. Êpey zeman lê dimînê, gund pê dihesê, bala xwe didêye ‘Eyne Zelxê keko çêlkê firinga ye tu qêmîş nabî lê binêrî. Dibê xwegînciyê xwe ji vir û wê da hatin. Mêrik dibê xuçê tu yê kê mêra bikîse xwegînciyê te tîn em te pêdîn. Dibê keko e mêra nakim. Ku min xêr bidiya minê ji mêrê xwe bidiya. Mêr li min heram bin. Sa’etikê

26 gêndî: ji tirkî hatiye hildan. Wek “kendi” ya tirkî ye, li herêma Efrînê berbelav e.

27 berqefîk: cihê binerdê yên sergirtî yên weke şikeft. (Şikeft an cihê sergirtî).

28 (heyata xwe) çirimîş kir: “hayatî çürümek”, ev qalibeke tirkî ye.

29 yaqîşmîş: ev peyv di wateya “şubh” ê de hatiye bikaranîn.

te'mê li wir nabîne. Ji wî gundî dere gundekî din. Dere gundekî din efendime soyleyim li wir jî wiha ye. Ji wî gundî jî derê. Ku da dere xwezgîncî jê nagerin tênê. Încâ gîşt gundekî mezin wekî hezar malî heye. Gîşt gundekî efendime soyleyim. Çû mala mixtêr kîjan e, mala mixtêr kîjan e? Çû mala mixtêr. Go keko ez êksîgeka xerîbim o ev jî lawê min e. Go ez dixwazim ti xirabakê tiştê bi mê dê, e têkevim. O ga û golik naxirê we heye se ezê ji we ra biçêrînim. Ê de mixtar jî dilê xwe pê şewitî, go zîrar tine. Tîne tê efendime soyleyim, xirabakê berqefkê didinê dikevîyê ew lawê xwe va. De ew xêra xwe lê dikê şîvê jêr tîne ew jêra nanîkî tîne ew jê ra tiştê tîne efendime soyleyim ê tê da xwew dikê. De artix bû naxircî, bû nator<sup>30</sup>. Berê nator hebûn, dexil dipan. Bû nator efendime soyleyim, wext û zeman pê ra derbas bûn. Dibê bi wexta dûr e bi şora nêzik e. 'Umrê Mecnûn bû çardeh sal, ketin panzda. De artix ga û golikê naxirê gunda diçêrîne. 'Eynezelx qêmîş nabe Mecnûn ji xwewê rake sibê. Derê naxirê kom dike tîne tê şûnê bêdera paşê tê radike ji xwewê. Rokê ji royê Rebbî 'alemê rabû ser xwe dêkê çû naxir maxur kom kir anî hat dan ser bêdera, fîtilî hat Mecnûn rakir. Mecnûn rakir go anê te xêr e ji xwew rakirim? Go e ketibûm xwewnik şeva eşq û mihbetik dila de hele bila mecnûn ban dêkê kê eşq û muhbeta dilê xwe çî ye.

(tembûr)

gerê nema dilê min dibê û dil dibêêê  
wexta 'Eynezelxê li serî sibê da li berî berbangêêê  
erê erê ga golik û naxirê kom dikê li serê bêderêêê  
tê radike Mecnûn telayê bi tenê ji xwewêêê  
erê mecnûn go lê anê lê anê lê anêêê  
erê anê dilê min liyane dilê min liyaneeee  
anê çima te e rakirim ji xwewa şêrîn û giran e  
anê ku ez ketibûm xwewnik xwe yê şevane  
eşq û muhbetik dilane  
ê lê anê vê ra dibêne Leyla Leylane oyyy  
gere dêkê digo yawriim Mecnûnê min yawrim yawrim  
yawrim dilê min liyane dilî min liyaneeee  
yawrim e wa ne xwewna şeva ku ez nemînim ne Leyla Leylan ne  
yawrim ewa ku ez nemînim şeytanê lanetulanê  
yawrim gerê tu nû tîye ciyê mêrane  
gerê yawriim yawrim ewa çalixçîkî gezgançîkî navî malane  
oxlîm ewa ne Leyla Leylane oyyy  
gere Mecnûn digo lê anêêê lê anê lê anêêê  
bi tekeve derdekî giranê te bigerînim li ser sî û sê hekîmêd loqmanê  
bi canî te yî can nebe şîfa û dermanê  
ê lê anêêê lê anêêê çow xwewnê min î şevan e  
Lêylê min î Leylanê  
eşq û muhbeta min î dilanê  
tu dikê îşê şeytanê neletulanê  
lê anê tu dikî ku e nû hatime ciyê mêranê

30 nator: beqçî (li herêma Efrînê tê bikaranîn).

tu çow ji min ra dikî çalixçî û gezgançîkî navî malane oyyy  
lê anêê tu li min helalkî nan û xweyê şîrê bera  
te bi mi ra diye li çola û kerbelane  
gerê digo yarim lo Emînê yawrim  
Mecnûnê min yawrim yawrim  
yawrim ew Leylê Leylane yawrim  
Leylê Leylan tu dibê ewa qîza Şêxê Zirkan e  
qelengê wê biha ye yawrim bi çêl û çar kîsan e  
yawrim tema dêykê te fiqare ye nikane qelengê wê bidê biha ye ne erzan e  
gerê yawriim yawrim dawê ji vê sevdê girane  
tema dayikê te pîrê xerîb e kesî xwe tine yawrim bêxwedane  
min e bavo yawrim min ne an e  
o xiltikê min çavê li va derane oyyy de lorê de lorê de lorê lorê  
gerê digo lê anêê heger ti dibê qîza Mîrê Zirkan e  
qelengî xwe çêl û çar kîsane bihayê ne têda ne  
lê anêê e ji te naxwazim ti mêl ti perane  
bes ti li min helalkî şîrê bera xwewna şevane  
anê te'm û cefayê te mi ra diye li çol û kêrbelane  
gere digo yawrim Mecnûnê min yawrim yawrim  
dilê min leyane oxil dilê min leyane  
ê lo yawriim tema dayikê te sefîl e yawrim qelengê xwe biha ye ne tê dane  
tema yawrim tu û dayikê pîr va diçêrînin ga û golikê naxirê gundane  
ê yawrim Mecnûnê min dawê ji vê sevdê girane oyyy  
gere digo lê anê dilê min leyane leyane  
e ji te naxwazim ti mal û ti perane  
lê anê bi mi de îzn û rûşqetê ku ez kê bervî xwe biftlînim çol û kêrbelane  
ya ezê bibînim xwewnê xwe şevane  
ya jî ez jî serî xwe dinîm diyarê rehmetê axa gorna ne  
yawrim yawrim Mecnûnê min yawrim

(tembûr)

gerê yawriim lo yawrim lo yawrim lo Mecnûnê min yawrim yawrim  
erê dilê mino dil dibêê  
Xwedê dînê dînenê mala 'Eynezelxê  
erê çiqasa dibêse ti çare nabî ji Mecnûn telayê bi tenêê  
erê erêê dibê here Mecnûnê min yawrim yawrim ji te ra oxir be oyyy  
gerê yawrim hevalê te be Xizir aleyselem çê siwarê keybê  
yawrim tu li kê derê bankê di bangîne te werê  
gerê de kekêê Mecnûn telayê bi tenêê  
radibe destê û lingê dêykê maç dikêê  
xatirê xwe jê dixwazê bervî xwe diftlîne çol û kerbelê  
o yawrim de yawrim Mecnûnê min yawrim oyyy

(tembûr)

(Hemgulî dibêje: Saet xweş bavê Xelîl saet xweş!)

Ê birano wexta ku dêkê îzîn dayê, bervê xwe fitiland çol û kerbela. Mecnûn heft sala geriya ri dirêj bûn, dirnax dirêj bûn, kinc lê neman, tî birçî sêfil, zelîl<sup>31</sup>, yoqsirlix<sup>32</sup>, zehmet. Çow bûye ela ku perîşan bûye. Rokê ji royê Rebbî ‘alemê gîşt ber şet û delavê Cizîrê, ka’niya Rasûl’eynê. Bala xwe dayê yekê ji wê da xwe hol dikê tê ser kaniyê. Yaw go wele wek ya min di xwewnê da diye ev be. Go ezê banê kim, ku ew be zate ew e ku ne ew be zate ewê min azar ke<sup>33</sup> ezê li ciyê xwe bisenim. Hele banê ke em sekin hele kê vê ra bê çi hele (bavê Xelîl).

(tembûr)

gerê Mecnûn digo

lê Leylêêê lê Leylê lê Leylêêê  
tu Leyla min î Leylane tu xwewna min î şevane  
tu eşq û muhbeta min î dilane  
ê lê Leylê eger ti Leyla Leylaneee  
eşq û muhbeta dilane Xwedê kê xwe ji min ra bike beyanee  
gere ji min ra xeber de delav û gêçîdê we Cizîrê di ku ra ne oyyy

64

gere mino Leyla Leylaneee  
bi dengekê bang fikir digo  
Mecnûno dilê min leyaneee  
serî min bi qurbanooo heft caraneee  
ketî mecalê heft salane  
çavê min çûne li rêk û yolaxa ne  
erê Leylan Leylan tu dibê ez bi xwe me  
de bûyrin bûyrin derbas be Mecnûno  
delav û geçîdê Rasûl’eynê di tengê te ra ne  
heta nikna tê ra derbas bûn deh car meriv  
av nadê kabê meriya ne

de were minooo Mecnûn telayê bi tenêêê  
xwe lê dixê delav û gêçîdê Rasûl’eynê derê ser kaniya Rasûl’eynê  
kekê ew Leyla Leylane hevdu dibînin vê sibêêê  
de were Xwedê kê Xwedê hebîne  
derdê eşq û muhbetê derdêkî giraneee  
gerê rûniştin li ba hevdu dikine ken û henek û mesqeriyane

gerê kekê Mecnûn go lê Leylê lê Leylêêê  
Leylê dilê min leyan e leyaneee

31 zelîl: rezîl, bêqîmet, bindest.

32 yoqsirlix: xizani, hêjarî, feqîrî. Ev peyv peyva “yoksulluk” ya tirkî ye.

33 min azar ke: hişyarkirin.



ketî mecalê heft salaneee  
e digirim li çol û baniya li deşt û kêrbelaneee  
ê lê Leylê mi têr xwew nekirî xwewa şevane  
Xwedê kê kabê xwe dîne serî xwe dinîm ser kabê te  
rakim xwewa xwe ya şevaneee oyyy  
erê dilê min leyane Leyla Leylaneee  
kabê xwe didine erdê serê Mecnûn didine ser kabane  
Mecnûn dikeve xwewa şêrîn û xwewa giraneee  
gerê kekê ro dagerî gihîşte berî şivaneee  
Leyla Leylane kê here qêmîş nabe serî rake dîne erda çolane

de were mino Leyla Leylaneee  
gerê fistanê xwe di bin serî Mecnûn da qut dikê derê malane  
dibê we' dî saetekê diduya ku ezê biftilim Mecnûnê xwe dinyalika bi derewane  
erê erêê wextanî Leyla Leylan derê  
balê xwe didiyêê bavikê xwe yê kalo ku ez nemînim Mîrê Zirkan e  
gerê konê gêr kirine  
gerê siwar kirine delûl û hêştirane  
ê kê bervî xwe biftilînin pozê yaylim û çiyaneee de lorêêê  
gerê Leylê digo lê anê lê anêêê  
lê anê dilê min leyane leyane  
li ser kaniya Rasûl'eynê anê di mi derket 'ewrane  
gere anê ku e reviyam gerê dawê fistanê mi jî bire bi xwe ra ne  
ê lê anê li ser kaniya Rasûl'eynêêê  
mi jî bîr kiriye koma zêrane  
bi mi de anêêê firsendekê nîv saetikê diduyane  
ku ez herim bînim komê zêrane

ku ez nemînim dêka Leylan Leylanê digo yawrim  
lê yawrim lê yawrim dilê min leyaneee  
carikê ku ez nemînim malê bar kirine li delûl û hêştiraneee  
yawrim wextê ku emê herim pozê yaylane  
kê werin etarê gundiyane  
ê lê yawrim ku ezê dîsa ji qîzê xwe ra bikirim ku lê nemînim konê zêrane oyyy  
de lorê de lorê lorê  
(tembûr)